# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (246):

## Gundê "Um Toba" ya niştecîkirinê, girtinine bêsûcane û şewtandina daristanan, dijberîkirinin li ser temenmezinina







Serokê Turkiyê **Erdoxan û wezîrên** wî ji nû ve di gotarên xwe de li ser armanca xwe ya bingehîn û mercê xwe yê neguhêz di rewaşa Sûriyê de "şerê terorê li Bakurê Sûriyê" (yanê **şerê hebûna Kurdan û maf û rola wan**) tekez dikin, herweha li ser girêdana Heleb bi "Mîsaqa wan a Niştîmanî ya Milî" ve (yanê **Osmaniyeke ferekirinê** ye nû), û weha jî li ser amedekirina pirojeyên "niştecîbûnê" li "Herêma Aram" -a derewîn- ji bo vegerandina milyonek penaberên Sûrî ji Turkiyê (yanê **barkirineke zorane** ji wan re, pêkanîna **guhertineke demografî** li seranserî Sûriyê, û kûrkirin û ferekirina wê li Herêmên Kurdî yên dagîrkirî bi

taybetî); Bê ku kêşeyeke wan bi rêxistinên terorîst radîkal û yên nandoz (mîna El'nesre û yên bilî wê) re hebe û yan jî di lihevhatina bi Rijîma Sûriyê re.

**Ev jî hin bûyerên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Gundê "Um Toba" yê niştecîkirinê yê nimûneyî:**

Weke hewildan ji kûrkirina **guhertineke demografî** ye demdirêj li Efrînê, Turkiya dagîrker bi riya destikên xwe di bin navine "fîxanî û xêrxwaziyê" de avakirina **gundine niştecîkirinê** yen nimûneyî li herêmê berdewam dike, ji bo bicîkirina anîndeyan û malmilkirina wan; Bi ser Gundê "**Besme**" de (yê ku li Başûrê Gundê "**Şadêrê**" - Şêrewa li gel "dibistanekê û gulîstaneke zarokan û mizgeftekê û navndeke tenduristiyê û binevahiyan hatiye avakirin", bi xêzedîtinê "/30/ K.M Bakur Rojavayê Heleb, /15/K.M Başûrê Bajarê Efrînê û /18/K.M jî ji Sînorê Turkiyê" ve dûr, li ser erdekî rûbera xwe /10/ hezar mitir çarkoşe û yî Hemwelatî "Ziyad Hebîb" ê ku neçar bûbû bifroşe, li ser du astan hatiye vekirin "a yekê bi /96/ perçemalan/şiqe li 4.10.2021an. Z û ya dudiyê jî bi /125/ perçemalan li 22.3.2022an. Z, û rûbera her perçemalekê jî /45/M çarkoşe); Gundê "**Um Toba**" (navê Bajaroka "Um Toba"/Parêzgeha El'qudis ê ku xelkê wê pere dane) li Başûrê "Besme" hate avakirin, li 8.5.2023an. Z hate vekirin, û ji /60/perçemalî pêk tê; Da ku tevahiya hejmara niştecîyên herdu gundan bigihêje dora /281 malbatî = 1700 nişteyî/.

Divê were zanîn jî ku herdu gund ji aliyê "**Komela Destên Sipî - Turkiyê**" ve û bi pereyên "**Komela Jiyankirina Birûmet/El'eyş Bîkeramê - Felestîn/48/**" (a ku hesabekî xwe li ba Benka "Hapo'alîm" a Isra'îlî ji bo komkirina alîkariyan vekiriye) hatin girtin.

**= Girtinine bêsûcane:**

Destlatên dagîrkeriyê li 10.5.2023an. Z Hemwelatî "**Nezmî Mihemed Hesen** /52/ sal ji xelkê Gundê Coqê" û "**Mes'ûd Hesen Mendo** /45/sal ji xelkê Gundê Zivingê - Navça Bilbilê" (yên li Bajarê Efrînê yê kevin rûdinin) bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re girtin, û ta niha bêsûcane girtî ne, û divê Were zanîn jî ku "Nezmî" berê jî li sala 2018an. Z hatibû girtin û "Mes'ûd" jî bêtirî carekê li sala 2019an. Z.

Û li 16.5.2023an. Z jî Hemwelatî "**Heyder Hisên Bekir**" jî ji xelkê Gundê "Hecxelîl" - Navça Reco bi behaneya ku wî wêne li kolanê girtine (girtina perçevîdiyûkê ji firoşgeha xwe ya pêlavan re), û "Asayêşa Leşkerî li Reco" di heman rojê de jî berda.

**= Şewatên daristanan:**

Bi ser berdewambûna heyama Buharê ya sargermî de, dîsa jî **agir daristanên mayîn dadiqultînin**, û "Berevaniya Sivîl li Efrînê" tekez kir ku tîpên/tîmên wê şewatên vêketine vemirandin:

- Li 13-14. 5.2023an. Z, daristana Gundê "Hechesna" - Navça Cindirêsê.

- Li 15.5 2023an. Z, daristana Gundê "Hecbilêl" - Navça Şiyê.

- Li 17.5.2023an. Z, hirşê Bajaroka "Kefersefrê" - N. Cindirêsê.

Û herweha jî got ku agir bi sedema şax û çawîrên hişk (bermayên qutkirina fere ji daristanên ihracê re ji aliyê Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" ve ji bo êzingkirinê û çêkirina komirê û bazirganiyê) gelekî fere dibin.

Û pêşinde nêrîn ew e ku **agir mebestkirî ne**, da ku li ser dijberîkirinên xwe bipeçinin yan jî derfetin nû ji qutkirinê re vekin, ji ber ferebûna wan dijberîkirinan û nizimbûna kanînên kokirina şewatan li ba dezgeh û destlatên xwecihî.

**= Binpêkirinine din:**

**-** Li 16.5.2023an. Z, du çekdarên serçavgirtî -li matoreke duloqî nîştine- Hemwelatî "**Elî Hisên Hesen** /30/sal" ji xelkê Bajaroka "Mabeta" - bi fêlbaziya jêpirsîna wî li ser "Meydankê", li cîgeheke berî erdê bêdera li ser riya ku dere bajarokê - sekinandin û hewil dan ku matora wî jê bistînin, lê bi sedema berevaniya wî bi ser neketin, vêca qurşîn avêtin lingê wî û reviyan.

**-** Ji dora heyvekê ve, û dema ku temenmezin "**Mistefa Bîlal/Malbata Bilko**" ji xelkê Gundê "Gewenda - Meydana" - Navça Reco gihîşte nav rezê xwe yê tirî (yê li ser riya Gundê "Şingêlê" yê hevcîwar, û yê ji aliyê milîseyên "Feyleq El'şam" ve desteserkirî) - weke hewildan ji bo vegerandina zeviyê xwe - du çekdaran mekin lêxistin, ji ber wê jî derizî û birîndar bû, û ji bo dermankirinê bo nexweşxanê hate şandin; Û ta niha gilî û daxwaza wî li ba Destlatên Dagîrkeriyê di derskirinê de ne.

Berdewakirina cîbicîkirina pirojeyên niştecîkirinê li Efrînê ji aliyê Dagîrkeriya Turkiyê û destikên wê ve, destêwerdanek bi robet û qebhete di rewşa Sûriyê de, metirsiyekê li ser pêşeroja Sûriyê û gelê wê çêdike, û tersî yasa û belgenameyên navdewletî ye.

21.05.2023 an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

**-** Herdu Gundên "Besme" û "Um Toba" yên niştecîkirinê, Başûrê Gundê "Şadêrê" - Şêrewa, Efrîn Gulana 2023an. Z.

**-** Şewatek li Daristana "Hecbilêl" - N.Şiyê, Efrîn 15.5.2023an. Z.